

Rêzgirtina Mafên Mirovan

Enehîte Murad

Sala 2011an ,dever dewleta Tonisê ye , ew ciwanê ku bêçar dibû encama merc û hoyên zor dijiwar jiyan li pêş çavên wî reş û tarî dibû ! wisan jî li kastîna bajêr, li pêş çavên xelkê Tonisê agir berdida bedena xwe ! û jiyana wî ji dest diçû . vêca jî , ew dikete rêzên pakirewanan û dibû simbola şoreşa yesemîn li Tonisê. Piştî vê bûyerê xelkê Tonisê bêdeng nediman ! piraniyên wan li dijî rijîma Tonisê xwepêşandan û raperîn lidardixistin û dirûşmên azadî û rêzgirtina mafên mirovan hildidan û hino –hino rijîma Tonisê li pêş vîn û dilêriya gel bêçar dibû nemaze, serok komarê dewletê Zeyn El-abdîn. Lewre jî, dev ji serokiyê berdida û bazdida ! vê yekê fikir ku , weke rûdaweke hevdem li pir dever û dewletên Erebyên mîna : Misir , Yemen, Lîbiye , Ceza,êr ,Behrên, Sûriyê û H.W.D bi serkêşiya ciwanan hewş vede û heyameke nû di Rojhilata Navîn de serî hilde !? Weke pêşiyên me gotine : Tu dar serî gihane esmanan nîne ? Belê, ta kengê ev rijîmên şoven û dîktetor yên mîna hurç û hovan li ser sîngê mîletên xwe pal vedin û bê şerm û fedî xêr û bêrên welêt daqurtînin , û hemwelatiyan weke kole ,perîşan , birçî bikin?. Piraniyên gelê Sûriyê bi hemû netewên xwe ve, hêviyên xwe bi serokê ciwan geş û bilind dikirin, ku ev serok Beşar wê karibe heyamê Sûriyê weke dewleteke

şaristanî ,pêvajok û dadmend vejîne, ta ku rêzgirtina mafên mirovan têde cî bigire. Wisan jî wê bibe simbola azadî,aştî û wekihevî di Rojhilata Navîn de. Lê mixabin, roj ji rojê rewşa Sûriyê kambax û wêran dibû gelê Sûriyê di nava heyameke biv , tris û birçîbûnê de, li ber xwe dida . Lê, hema li vê dawiyê xelkê Sûriyê jî piştî bûyera Derayê ku ew zarokên biçûk , ku temenê wan dora heştalî, peyên rijîmê ew didane ber darê îşkencê encama wê yekê xelkê bajarê Derayê bêdeng nediman, dîwar û sînorên tirsê hildiweşandin û di riya xwepêşandanan re daxwez û hêviyên xwe weke dirûşme bi rengekî aştiyane aşkere diyar dikirin û digotin : Bijî Azadî bimre koletî û di gel wê yekîtiya gelê Sûriyê nîşan didan . Wisan, jî rijîma Sûriyê har û dîn dibû , bajarê Derayê tarûmar dikir, bi tang, top ,debabe qurşînên xwe li hemwelatiyên destvala dibaran. Encama wê bi sedan xelkê Derayê dihatine kuştin ,birîndar û girtin. Lewre jî, li pir dever û bajarên Sûriyê mîna Şam û derdora wê ,Benyas, Tertos, Laztqiyê ,Hemê ,Reqê û H.W.D, tev li dijî rijîma Sûriyê disekinîn raperîn û xwepêşandan lidardixistin. Zor mixabin, ku îro Sûriya me bûye kastîna şer û cengê û rêzgirtina mafên mirovan binpê dibe. Heyf û mixabin, ku ciwanên gelê Sûriyê bi hemû netewên xwe ve, bi destê rijîma bêbext li kastîna û çateriyan, di xwîna xwe de vedigevizin .